# MUZÎK

## SERETAYÎ

## 6

2019/2020

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Muzîkê ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**- Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


BEŞA YEKEM ........ 9
LÊVEGER ........ 10
KILÎLK ........ 16
FILÛT ........ 18
JOHAN SEBASTIYAN BAX ........ 19
HER DU TEŞEYÊN RITIMÎ ........ 20
TEŞEYA RITIMÎ ........ 22
STRANA BERÇELA ........ 23
PIYANO (PIANO) ........ 24
CEMÎL HORO ........ 25
NOTE Û STRANA KOMÎ ........ 27
BEŞA DUYEM ........ 29
NAVBERÊN MUZÎKÎ (BÊHNOK) 1 ........ 30
NAVBERÊN MUZÎKÎ (BÊHNOK)2 ........ 32
STRANA BÊRÎVANÊ ........ 34
HESEN ZÎREK ........ 35
ÇENG ........ 37
XÊZÊN ALÎKAR ........ 38
RASTNIVÎSA RITIMÎ ........ 39
XWENDINA NOTEYA MUZÎKÎ ........ 40
STRAN Û NOTEYA MUZÎKÎ ........ 41
BEŞA SÊYEM ........ 43
KOMA RITIMÎ ........ 44
STRANA QUMRÎKÊ ........ 45
DUBAREKIRIN ........ 46
STRANA KOMÎ ........ 47
PILEYA "SÎ" YA STÛR ........ 48
MALBATA TÊLDAR ........ 50

# SIRÛDA NETEWEYÎ EY REQÎB



Ey reqîb her, maye qewmê kurdziman
Naşikê û danayê bi topê zeman
Kes nebê kurd dimirin, kurd jîn dibin
Jîn dibin qet nakevî ala kurdan

Em xortên rengê sor û şoreş in
Seyr dike xwîna diyan me darijand
"Dîsgotin"

Em xortên Midya û Keyxusrew in
Dîn îman û ayîman her niştiman
"Dîsgotin"

Lawê kurd e, bûye ser pê wek şêran
Da bi xwîn neqşîn bike tacê cîhan
"Dîsgotin"

Xortê nuh tev hazir û amade ne
Canfîda ne canfîda, her canfîda
"Dîsgotin"

Yûnis Reûf-Dildar

## BEŞA YEKEM

1. Lêveger
2. Kilîlk
3. Filût
4. Johan Sebastiyan Bax
5. Her Du Teşeyên Ritimî
6. Teşeyê Ritimî
7. Strana Berçela
8. Piyano
9. Cemîl Horo
10. Note û Strana Komî

Wane 1

# LÊVEGER

## A. LÊDANÊN RITIMÎ

Lêdana ritimî (Dum û Tak), di xaneyekê de, bihêzbûn û lewazbûnê, diyar dike.

Lêdanên ritimî, bi van sembolan tên nîşandan:

1. (DUM) a dirêj 

   (DUM) a kin 

**Dûvikê sembolê, li jor e.**

2. (TAK) a dirêj 

   (TAK) a kin 

**Dûvikê sembolê li jêr e.**

3. (ÊS) a dirêj 

   (ÊS) a kin 

- **DUM:** Di ritimê de, tê wateya lêdana bihêz (xurt).
- **TAK:** Di ritimê de, tê wateya lêdana nîvxurt.
- **ÊS:** Di ritimê de, tê wateya lêdana lawaz.

# B. TABLOYA RITIMÎ

| YEKEYA DEMÎ | BILÊVKIRINA WÊ |
|---|---|
|  | Ta' a' a' a |
|  | Ta' a |
|  | Ta |
|  | Ês |
|  | Ta tî |
|  | Ês tî |
|  | Tî ês |
|  | Ta Fa Tî Fî |

## C. NÎŞANÊN GUHERTINÊ

Nîşanên guhertinê, li aliyê çepê yên dengê muzîkî tên danîn û dibin sedema bilindkirin an nizimkirina wan dengan.

- Nîşana bilindok (diyez) ♯
- Nîşana nizimok (bemol) ♭
- Nîşana rastok (beccare) ♮

**1-** Nîşana bilindok (diyez) ♯ **:** Deng, nîv pileyê bilind dike.

**2-** Nîşana nizimok (bîmol) ♭**:** Deng, nîv pileyê nizim dike.


**3-** Nîşana rastok (bîkar) ♮ **:** Deng, vedigerîne ser awayê xwe yê xwezayî.

**Nîşanên guhertinê bi du awayan tên:**


1. **Nîşanên sereke:** Rasterast li paş kilîlkê tên danîn û bandorê li ser qata dengî ya hemû perçeyên muzîkî, dike.

Mînak:

Fa diyez



Sî bîmol



2. **Nîşanên rastok:** Tenê bandorê li qata dengan dike ku li kêleka çepê ya pileyan, tê danîn.

Mînak:



## D. HER DU TEŞEYÊN RITIMÎ



❖ Em bi awayekî ritimî, van teşeyan bi lêv bikin.
❖ Bi çepikan re, em teşeyên ritimî bistrên.



Ta'a'a'a

Ta'a

Ta

Ta tî

Ta fa Tî fî

❖ Em bi hev re, vê teşeya nû, bi awayekî ritimî, bi lêv bikin:



Ta Tî Fî

❖ Vê rahênana solfayî, bi hev re bixwînin û bistrên:



# KILÎLK

**Kilîlk:** Nîşaneke ku li destpêka pêlekanê tê danîn. Di nivîsa muzîkê de, sê cureyên kilîlan tên bikaranîn:



**Kilîla Sol**




**Kilîla Fa**



**Kilîla Do**

## 1. Kilîla Sol


Ji bo dengên zirav (tûj) tê bikaranîn. Di stranê de, ji bo dengên jin û zarokan, her wiha ji bo diyarkirina wan dengên ku li ser rasteka duyem tên danîn, tê bikaranîn. Ango navê rasteka duyem, dike **Sol**. Her wiha, ji bo amûrên mîna: keman, bilûr, ûd, tembûr, qanûn, biziq, trompet û hwd jî tê bikaranîn. Di çeng (arp) û piyanoyê de jî ji bo destê rastê tê bikaranîn.





## 2. Kilîla Fa

Ev kilîlk, ji bo dengên stûr tê bikaranîn û di stranê de ji bo stranbêjên mêr, tê bikaranîn.

**Kilîlka Fa,** dikeve ser rasteka çarem a pêlekanê û hemû dengên ku dikevin ser rasteka çarem, dike **Fa**. Dema ku çeng û piyano bi destê çepê tên jenîn, kilîlka **Fa** tê bikaranîn. Her wiha, ji bo çêlo û basonê jî tê bikaranîn.




Li gorî kilîlka **Fa**'yê li ser rastekan, cihê pileyan.




Li gorî kilîlka **Fa**'yê di valahiyan de, cihê pileyan.

### 3. Kilîla Do

**Cureyên Kilîkla Do:**

a. **Kilîlka Do** (Li ser rasteka yekem): Ji bo dengên bilind ên stranbêjên jin, (Soprano) tê bikaranîn.




b. **Kilîlka Do** (Li ser rasteka çarem): Ji bo dengên bilind ên stranbêjên mêr, (tenor) tê bikaranîn.




**Têbînî: Li gorî kilîlkan, cihê pileyan jî tê guhertin.**

Wane 3

# FILÛT

**Filût:** Amûreke muzîkê ya pifikî ye, ji dar an jî pilastîkê tê çêkirin.

Di vê amûrê de, cihê pifkirinê (cihê dev) heye. Di hin cihên wê de, kunek ji bo tiliya hevderêsê di dema sazkirinê de, tê bikaranîn û 7 kunên din, di aliyê beramber de, ji bo danîna hemû tiliyên din, hene:

Sê kun ji bo destê jorîn û çar kun ji bo destê jêrîn in . Dema bikaranîna filûtê, vedigere nîvê sedsala 19`an.

Ev amûr bi saya sazvanê Alman Siyobald Bîm (Theobald Pim), hatiye bipêşxistin.

Ev amûr, li Ewropayê di nava amûrên muzîkî yên tîmên leşkerî dihat bikaranîn, lê di dema me ya îro de, di nav amûrên pifikî yan jî orkêstrayê de, tê bikaranîn.



Wane 4

# JOHAN SEBASTIYAN BAX (JOHANN SEBASTIAN BACH 1685-1750)



Sazvan û awazkarekî Alman e. Li bajarê Ayiznax ji dayîk bûye. Di malbateke sazvan de, mezin bûye. Li ber destê bavê xwe fêrî xwendinê bûye û piştî mirina bavê wî, li ber destê birayê xwe yê mezin, xwendina xwe berdewam kiriye.

Di sala **1703**`yan de, wekî sazvanê kemanê di tîma mîrê kantonê de, kar kiriye. Di sala **1707**`an de, bûye sazvanê orgê û paşê bûye rêveberê, tîma stranî.

**Hin karên JOHAN SEBASTIYAN BAX:**

1. Awazên ku ji orgê re, danîne; ew jî 122 koral û 6 sonata ye.
2. Sazên klavîsan di parçeyê sonatayê de.

# HER DU TEŞEYÊ RITIMÎ



- ❖ Em bi awayekî ritimî, van teşeyan bi lêv bikin
- ❖ Bi çepikan re, em teşeyên ritimî bistrên

 Ta'a'a'a

 Ta'a

 Ta

 Ta tî


 Ta fa Tî fî

- ❖ Em bi hev re, vê teşeya nû ya yekem bi awayekî ritimî, bi lêv bikin:




Ta Tî Fî

❖ Em bi hev re, vê teşeya nû ya duyem, bi awayekî ritimî, bi lêv bikin:




Bixwînin û vê rahênana solfayî bi baldarî bistrên. Li teşeya nû jî baldar bin:



Wane 6

# TEŞEYÊ RITIMÎ

Ta Fi 

Di muzîkê de, em erkê xala demkî nas bikin:

**Xal:** Her dem li aliyê rastê yê pileyê tê nivîsîn û yeksanî nîv dema pileya li pêşiya wê ye.

Ez vê teşeyê nîgar bikim: 

Ta Fî

- Ez teşeyê ritimî bi nîşana terazûyê re, bixwînim:
- Bi rêya dest û çepikan, ez vê teşeyê bi lêv bikim:



Ta Fî

❖ Ez vê rahênana li jêr, bi awayekî ritimî û bi çepikan re, bixwînim:

❖ Bi binavkirin pileyan re û bi nîşana terazûyê re, ez vê rahênana li jêr, bixwînim:



Wane 7

# STRANA BERÇELA

❖ Li gorî waneyên me yên bûrî, li gorî pêlekan û teşeyên ku nû hatine bidestxistin, em bi hev re, vê strana binote ye bi awayekî xweş, bistrên:




Çelê li ber çelan bilind e

Hey lo lawê min lawo

Yara min bejin bilind e

Çelê li ber çelan dirêj e

Yara min bejin dirêj e

Temo muxtar e ji mêj e

Çelê li ber çelan sor e

Temo muxtarê par e

Yara min bejin dar e

Gelêrî

Wane 8


# PIYANO (PIANO)

Piyano: Kodeke dengdêrî ya mezin e, ji dar an jî hesin tê çêkirin.

- Bi rêya hin kilîtên spî û reş ku li ser depekê hatine bicihkirin, tê lêdan. Bi navê klaviya yên ku bi hin zendan ve tên girêdan û bi awayekî ritimî li têlan dide, tên nasîn.
- Di nêzî salên 1700`î de, sazvanê îtaliyayî Bartolomeo Cristofori (Bartolomiyo Kirîstoforî), amûra piyanoyê çêkiriye.
- Navê wê, ji kurtnavê îtalî "Piyano Fort" ê ku bi hêsanî, nazikbûn û sivkayiyê tê nasîn, hatiye dariştin.

Ez û hevalên xwe bi hev re, li parçeyekî muzîka piyanoyê, guhdar bikin:





Wane 9

# CEMÎL HORO



Hunermendê kurd Cemîl Horo, di **10.03.1934**'an de li gundê Sarîncekê yê Efrînê ji dayîk bûye. Bi sê zimanan daxifî; kurdî, tirkî û erebî.

Di çûna xwe ya bakurê Kurdistanê de, Kemal Orgon û hunermenda kurd Eyşe Şan dibîne û her sêyan bi hev re, stran digotin.

Hunermend Cemîl Horo, di **19.09.1989**`an de jiyana xwe ji dest daye.

## Hin berhemên wî:

1. Lo bavo
2. Wey lawo
3. Memê Alan
4. Xem
5. Zalim
6. Xana dinê

Wane 10

## NOTE Û STRANA KOMÎ

### Canê Canê

❖ Em bi hev re vê stranê li gorî noteyê, bi rêya alavên heyî, bistrên:




Canê canê canê
Kulîlka mala xanê
Canê canê canê
Esmerê bêrîvanê

Mi b'qurbanê rebenê
Danî derdê qelenê

Canê canê canê
Kulîlka mala xanê
Canê canê canê
Esmerê bêrîvanê

Navê lawik nizanim
Navê keçkê Siltanê
Canê canê canê
Kulîlka mala xanê
Canê canê canê
Esmerê bêrîvaê

Poz gulê xizêm zerê
Kesera ser keserê
Canê canê canê
Kulîlka mala xanê
Canê canê canê
Esmerê bêrîvanê

Gelêrî

# BEŞA DUYEM

1. Navberên (bêhnok) muzîkî 1
2. Navberên (bêhnok) muzîkî 1
3. Strana Bêrîvanê
4. Hesen Zîrek
5. Amûra Çengê
6. Xêzên Alîkar
7. Rastnivîsa Ritimî
8. Xwendina Noteya Muzîkî
9. Stran û Noteya Muzîkî

Wane 1


# NAVBERÊN (BÊHNOK) MUZÎKÎ 1

## Navbera muzîkî (bêhnok):

Ew dûrbûna ku di navbera du pileyên muzîkî yên berbijor an jî berbijêr de ye ku ne merc e, li dû hev rêz bin, dorpêçkirî ye.



**Ez bêhnokê di pîvana yekem û hin pîvanên din de, bistrêm:**





## Hejmarên bêhnokê:


Ji her bêhnokekê re hejmarek heye ku wê destnîşan dike. Ev jî di nava xwe de jimara hin pileyan dihewîne. Ev yek jî bi rêya jimartina berbijor an jî berbijêr, xuya dike. Mînak:



Bêhnoka yekanî    Bêhnoka duyanî    Bêhnoka sêyanî    Bêhnoka çaryanî




Em vê rahênanê, bi awayekî ritimî û bi navê pileyan, bixwînin:



Wane 2

## NAVBERÊN MUZÎKÎ (BÊHNOK)  2

- Ez van bêhnokên li jêr bistrêm:





## Sînorên bêhnokê:

- Her bêhnokek, du sînorên wê hene:

a. Sînorê jêrîn
b. Sînorê jorîn


Sînorê jêrîn, ew dengê herî stûr e û sînorê jorîn, ew dengê herî tûj e. Mînak:





## Em berê bêhnokê nas bikin:

Bêhnok, ber bi jêr ve yan ber bi jor ve ye:

1. Bêhnoka muzîkî, dema ku ji sînorê jêr dest pê bike, berbijor e. Mînak 1
2. Bêhnoka muzîkî, dema ku ji sînorê jor dest pê bike, berbijêr e. Mînak 2




Bêhnoka berbijor




Bêhnoka berbijêr

- Bi rêya perspektîfên mamosteya/ê xwe, em di vê rahênanê de, hin bêhnok û berê wan, diyar bikin:






Wane 3

# STRANA BÊRÎVANÊ

- Li gorî waneyên bûrî, xwendina noteyê û naskirina me ji hin tiştên cuda re, em vê stranê bi komî û bi yek dengî bistrên:




Bêrîvanê malwêranê, şêrînê wey bê xwedanê
Zerka te ji boy çi vala ye, meşka te ji boy çi qetyaye
Bêrîvanê malwêranê şêrînê wey bê xudanê

Pezê te bo çi hêlê pê belabe ew kit kêtê
Bêriyê bêje şivanî guh bide pezê xudanê
Bêrîvanê malwêranê

Bêriyê bêje bêriya esmer û can û zeriya
Nêzîk e ew buhar bêtin, ew buhara pez bizêtin
Bêrîvanê malwêranê

Bêriyê qêr ke sitrana da tu nake êş û jana
Em ji birçê qet namirin em ji tirsê qayîmtir in
Bêrîvanê mal wêranê

Gelêrî

Wane 4

# HESEN ZÎREK



Hunermend û helbestvanê kurd **Hesen Zîrek**, di sala **1921**`ê de, li rojhilatê Kurdistanê li bajarê Bokanê ji dayîk bûye. Navê bavê wî, Evdile ye. Di **8-9** saliya xwe de, dest bi karkeriyê kiriye. Di **12** saliya xwe de diçe biyaniyê (koçberî). Di sala **1953**`yan de, li beşa kurdî ya Radyoya Bexdayê bi cih dibe û bernameyên stranbêjiyê pêşkêş dike. Di sala **1958**`an de, vedigere bajarê xwe.

Demekê di Radyoya Mehabadê de dixebite. Piştre wî dişînin beşa kurdî ya Radyoya Tehranê û ew li wir gelek berhemên hêja tomar dike.

Hesen Zîrek, li wir bi Medya Xanima Zendî re, hevjîn dibe. Piştre diçe Radyoya Kirmanşahê û li wir gelek stran û awazên hêja, tomar dike.

Di sala **1967**`an de, bi armanca tomarkirina stranan, diçe Radyoya Bexdayê, lê stranên wî tomar nakin û ew tê girtin. Piştre wî radestî Îranê dikin.

Hesen Zîrek, di 28`ê pûşpera 1972`yan de, jiyana xwe ji dest daye.

Bi keda xwe, di muzîka kurdî de, cihekî girîng girtiye û gelek berhem afirandine. Ji ber vê yekê, ji aliyê gelê kurd ve, her dem bi nirx û giranî tê bibîranîn.

## Hin Stranên wî:

1. Ey Niştîman
2. Were Qurban
3. Newroz
4. Li Baxan Ahû Nalim Dêt
5. Nesrîn Emrim Buhar e
6. Yalah Şofêr



Wane 5

# ÇENG

**Çeng**, amûreke muzîkê ya têlî ye. Dirêjahiya wê, 170 cm ye û firehiya dengê wê, şeş oktav û nîv e. Li jêrî wê pêlek (pêdal) heye (ji bo sazkirina hin nîşanên taybet ên mîna: bilindok û nizmokan).

Çeng, di komên senfonî de, amûreke muzîkî ya pir girîng e.


Ev amûr, ji amûrên muzîkî yên herî kevnar e û dîroka wê vedigere 1200 BZ.




Wane 6

# XÊZÊN ALÎKAR


Hin caran, hin xêz li jor, an jî li jêra pêlekanê tên danîn. Ew xêzên li jor, ji bo tûjbûna deng û xêzên li jêr, ji bo stûrbûna deng in û ji derveyî pêlekanê tên danîn.




## Li gorî **kilîlka Sol** xêzên alîkar




## Li gorî **kilîlka Fa** xêzên alîkar





## Li gorî **kilîlka Do** xêzên alîkar



Wane 7

# RASTNIVÎSA RITIMÎ

- Pileyên muzîkî, bi jenîna mamoste re, bibêje.
- Li jenîna mamoste, pile pile guhdar bike.
- Pileyên ku tu ji mamoste guhdar dikî, li ser pêlekanê binîvîse.
- Ji van pileyên ku te ji mamoste guhdar kirine, rahînanekê pêk bîne.
- Demên vê rahînana ku te saz kiriye, sererast bike.



Wane 8

# XWENDINA NOTEYA MUZÎKÎ

## Hîndarî 1:



## Hîndarî 2:



Wane 9

# STRAN Û NOTEYA MUZÎKÎ

## Çoxê Mino

❖ Me hin teşeyên nû bi dest xistin û em fêrî nîgar û xwendina wan jî bûn. Li gorî noteyên ku bi me re derbas bûne, em bi awayekî komî, vê stranê bistrên:

Çoxê mino hirya berana




Wey malê mino hirya berana
Dabû ristin destê nezana
Wey malê mino destê nezana
Çoxib teng e negrit milana

Çoxê mino ji biskê bizina
Wey malê mino biskê bizina
Dabû ristin destê mezina
Wey malê mino destê mezina
Çoxib teng e negrit ji bazina
Wey malê mino negrit bazina

Çoxê mino mûyê karika
Wey malê mino mûyê karika
Dabû ristin destê keçika
Wey malê mino destê keçika
Çoxib teng e negrit zendika
Wey malê mino negrit zendika

Gelêrî

# BEŞA SÊYEM

1. Koma Ritimî
2. Strana Qumrîkê
3. Dubarekirin
4. Strana Komî
5. Pileya "Sî" Ya Stûr
6. Malbata Têldar

Wane 1

## KOMA RITIMÎ

❖ Ez û hevalên xwe li gorî alavên li dibistanê hene, bi hev re, van rahênan bistrên:






Wane 2

# STRANA QUMRÎKÊ

Bi hev re, bêyî ku em li noteyê binêrin, vê stranê bistrên

Qumrîkê ez romî me belê
Delalê ez romî me
Kumsor û efendî me belê
Kumsor û efendî me
Xulam çavên reşbelek
Aşiqê keçka gundî me

De yar yar yar, de yar yar yar
De yar yar yar, de yar yar
De yar yar yar, de yar yar
Bê te sebra min nayê

Qumrîka li ser zinara belê
Delala li ser zinara
Kulîlka nava dara belê
Kulîlka nava dara
Heyfa çavên reşbelek
Ketiye destê neyara

De yar yar yar, de yar yar yar
De yar yar yar, de yar yar
De yar yar yar, de yar yar
Bê te xewka min nayê

Gelêrî

Wane 3

# DUBAREKIRIN

❖ Dubarekirin, tê wateya ku her xwendarek li dû mamosteya/ê xwe, tiştê ku tê gotin an jî stran, dubare bike ( ji bo ku karibe bi awayekî tekane bistrê).

Mamoste, xwendekarên xwe dabeşî du beşan dike:

- Koma 1`ê: Malika destpêkê ya stranê distrên.
- Koma 2`yan: Malika destpêkê ya dubarekirî, distrên.

Ka em bi hev re, vê rahênanê bi awayekî ritimî û bi navên pileyan, bixwînin:

- Em vê rahênana solfayî, bi rêbaza dubarekirinê bistrên:



Wane 4

# STRANA KOMÎ

## Xalxaloka Çema

Xalxaloka çema
Şemamoka lema
Te ha ji xwe nema
Pê diket kul û xema

Gul yazê lîlozê
Lêv şekirê bozê
Berê mi da dozê
Çi dikî dibê hema

Çavên te yî spehî
Du biskê sêşehî
Rondik ji min lehî
Hew nas dikin şema

Ez xortekî rind im
Rêya gel na berdim
Xwînê didim merdim
Divêm reqs û sema


Gulîstana'm kanî
Kê bir û neanî
Rojek wê bê şanî
Her tişt dibê hema

Stran: Mihemed Şêxo

Wane 5


## PILEYA "SÎ" YA STÛR

- ❖ Em cihê pileya "Sî" ya stûr li ser pêlekanê nas bikin.
- ❖ Em awayê bilêvkirina pileya "Sî", di demên cuda de bibêjin:



- ❖ Em dengê "Sî" yê stûr ji dengên pileyên din, nas bikin.

Em pileya "Sî" di bin xêza alîkar a pêlekana muzîkî de, di lênûsa xwe de, xêz bikin:



❖ Bixwînim û rahênana solfayî bistrêm:



Wane 6

# MALBATA TÊLDAR

Alavên têldar, ji 4 cureyan pêk tên û ew jî ev in:

1. Violin: Keman
2. Viola: Viyola
3. Cello: Tşêlo
4. Double bass: Kontir bas




Ev her çar alav ji malbatekê ne û di teşeya xwe de pir nêzî hev in (hem ji aliyê teşe û hem jî ji aliyê jimara têlan û kevanên wan ve).

Di gewdeyê her yekê ji wan de, kuneke mîna tîpa "f"yê heye.

# BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

| Heftî / Meh | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| **Rezber** | | | Sirûda Neteweyî Ey Reqîb | Lêveger |
| **Cotmeh** | Kilîlk | Filût | JOHAN SEBASTIYAN BAX | Her Du Teşeyên Ritimî |
| **Mijdar** | Strana Berçela | Piyano | Cemîl Horo | Note û strana Komî |
| **Berfanbar** | Navberên Muzîkî (Bêhnok) 1 | Navberên Muzîkî (Bêhnok) 2 | Strana Bêrîvanê | Hesen Zîrek |
| **Rêbendan** | Lêveger | Nirxandin | Bêhnvedan | Bêhnvedan |
| **Reşemeh** | Çeng | Xêzên Alîkar | Rastnivîsa Ritimî | Xwendina Noteya Muzîkî |
| **Avdar** | Stran û Noteya Muzîkî | Koma Ritimî | Strana Qumrîkê | Dubarekirin |
| **Cotan** | Strana Komî | Pileya "Sî" ya Stûr | Pileya "Sî" ya Stûr | Malbata Têldar |
| **Gulan** | Lêveger | Nirxandin | | |